Dostên xoşewîst, îro, nêvî ji bedena min, bavê zarokên min, mezinê malbata me û birayê we, em bi rê dikin. Bêyî ku em li çep an rastê xwe, li paş an jî pêşya xwe kesekî bêşînin an jî bêhurmetyekê bikin, bêyî ku em sloganên biqîrin, pankartan vekin, em bêdeng bi xwepêşandaneke ya rûmetê radibin. Bi vî rengê bêdengiyê, li vir em dengêkî gur dikin.

Temenê wî çî dibe bila bibe, dikare 17 an jî 27 salî be, qatil kî dibe bela bibe, ez dizanim ku ew carekê pêçekêk bû. Bêyî bersiva pîrsa bê ka jî pêçekêkê çawa qatîlek çêdibe, tiştêkî em bikin nîne gelî xoşewîstan...

Gelî xwişk û birayan, jê hezkirina wî a li himber rasbûyînê, zelaltiyê û dostaniyê ew anî van rojan. Cengawerîya jêhezkirinê deng bi wî xist, ew mezin kir.

Dibêjin ku ew kesekî navdar û mezin bû. Ez ji we dipirsim; ma ew mezin navdar hatibû ser ruyê dinyê? Na xêr! Ew jî min we hemûyan, ji diya xwe re çêbibû. Ew ne li asîman lê ji ser ruyê axê bû. Dê birize bedena wî jî wek ya me! Lê, ruhê wî yê jindewar, karê ku ew pê radibû, uslubê wî, çiruskê hezkirînê yê di çav û dilê wî de, ew mezin kiribû.

Meznayî, ji ber xwe ve, bi dest nakeve. Tiştê ku mirov pê radibe, mirovan mezin dike. Erê, wî meznahî bi dest xist. Lewra mezin hizirî, axaftina wî mezin bû. Îro, bi hatina xwe ya vir re, em giş hêja û mezin fikirîn. Hûn bêdeng, mezin axifîn. Hûn ji mezin in.



Ranewestî, qîma xwe bi îro tenê neyênin!

Îro, li Turkiyeyê, wî mîladê saz kir. Hûn jî mohra wê mîladê ne. Bi wî re manşet, gotar û qedexe hatin guhertin. Ji bo wî çî “kozîkên ziyaretan” an jî “tabû” nîn bûn. Peyva wî û a dilê wî mîna hev bûn.

“Temenê wî çî dibe bila bibe, dikare 17 an jî 27 salî be, qatil kî dibe bela bibe, ez dizanim ku ew carekê pêçekêk bû... ji pêçekêkê çawa qatîlek çêdibe...”

Wî bedelek mezin da. Pêşerojên ronî - ku bedelan dixwazin - bi hezkirina ji Hrantan û bawerî bi wan ve pêktên. Bi kift, tjang û girtina xûnekê di ser ya din re, em pêşerojên ronî nabînin...

Xoşewîstê min, ma kî dikare peyvên te jibîra bike? Ma çî tarîfî dikari kirinên te, gotinên te ji bîra mirov bibe xoşewîstê min? Ma tiştên ku rûdane û rûdidin, dê kî ji bîra me bibe xoşewîstê min? Gelo

tirs? Ma jîyan? Gelo şavsofî? Ma kêf û sefaya dinyê? Gelo mirin dê ji bîra me bibe xoşewîstê min? Na xêr, çî tarîfî nikare wan ji bîra me bibe dildarê min.



Min jî ji te re nameya evîne lê kir. Nivîsandina van rêzan ne hesan bû dildarê min! Bi xêra Hisûsa min ev peyv nivîsîn, ez deyndarê wî me xoşewîstê min. Em mafê wî, bidine wî. Em mafê herkesî bi şûnde li wan vegeirînin, dildarê min.

Tu ji hezkirên xwe bi dûr ketî, Ji zarok û neviyên xwe veqetiyayî. Tu ji ên ku îro hatine te bi rê bikin bi dûr ketî. Tu ji himbêza min derketî û çûyî. Te welatê xwe terk nekir!

Rakel Dink

*Wergera kurdî
Seyidxan Anter*

1) Ev gotara Rakel Dink hinekî hatiye kin kirin.

Serdana piştî 31 salan

Dr. Heznî HACO

“Berî ku şev li Swêdê xwe kêlî bi kêlî dirêj bikin min û birayê min Feylezûr behaneyin vala peyda kirin û me berê xwe da Qamişloka rengîn.”

Li Şamê em bê astengî ji firokxanê derketin. Em çend rojan li wir man. Qaşo karin pir pêwîst hebûn ku em ê bi wan rabûna. Ma rapora ku me li vegeerê radestî keçapên xwe bikra, dê çawa vala ba?

Li Qamişlo em pêrgî birêz Dawûd Baxistanî hatin. Me jê re got ku di dilê me de heye ku em bi serdanekê herin başûr. Wî yekser tēkilî bi hevavê xwe re danî û ji wan xwest ku li Ibrahîm Xelîl pêşwaziya me bikin.

Min jibîrkir ku di serî de bibêjim ku ez û birayê xwe xwedî du dîtînen siyasî yên cuda ne. Ew alîgerê PDK-Iraq, ne ya Sûrî ye, û ez - li gor ku ji min re dibêjin - ez xwe jê naşom - Apoçî me. xwezayî ye ku nîrxandina min û wî ji vê serdanê re dê ne wek hev be.

Tevî ku Qamişlo rih û giyana min e, lê dema me sînor derbaskir û ketin nava bajarê Nisêbînê û min ew paqijî, rēk û pêkiya sikak û kolanên - ku mirov bi mikroskopê jî piçek gemar û kîsên naylonan ên reş nabîne, şeweyê ajotina otomobîlan - nişanên xuyayî yê zihniyeta pêşketî ne. Van û gelek tiştan hişt ku hezkirina min ji vî bajarî re yekcar zêde bibe. Min hest pê kir ku Qamişlo dilê xwe ji min digre û ruyê xwe ji min diqermeçîne.

Piştî ketina xaka bakur xortekî lihevhatî û xwînşîrîn pasportên me ji dest me girtin daku zû karên rotinî yên derbasbûna sînor bibe serî. Devliken pasportên me dan dest me û got: Heyra em dijminê hev in. Ez ji mala Cimo(1) me û hûn ji mala Haco ne.

Bi germî destê me hejand û berî ku here Feylezûr jê re got: Me bi xwe ev neyartî ji mêj ve jibîrkirî ye. Ji min re weha hat xuyakirin ku ew bi xwe jî êdî nema pênc qurûşan bi wê dijminatîyê dide.

Bi rojava re em ketin paytexta Bedirxaniyan a li ser Avamezin (2). Dem nebû ku em serekî li gorna Mem û Zînê bidin. Dem nebû ku li Zankoya Sor bipirsîn, dem nebû Birca Belek bibînin. Min keserek kişand lê di dilê xwe de got: Ez dê van kul û derdan di buhara vê salê de ji dilê xwe derxim.

Niv se'et tēve derbas nebû em

gihaştin Silopî. Ne li Nisêbînê, ne li Cizîra Botan - ku em hêdî hêdî û liser xwe - tēve derbasbûn û ne ji li Silopî şildim-bildim ket guhên min. Vê diyardeyê hişt ku çeng û per bi min ve çê bibin. Ta sala 1977an ez carnan bi serdan diçûm bakurê Kurdistanê û vê şildim-bildimê dihişt ku mejî di serê min de nemîne. Me xwest ku şeva xwe li vî bajarî biqedînin. Aşxaneyek di kêleka ûtêlê de hebû. Min ji Feylezûr re got ku min di jiyana xwe de goştêk hewqas xweş û nazik ne xwariye. Wî li min nêrt, beşîşî û got: Helbet. Goştê bakur e! Gelo xweşiya vî goştî bû yan nebi-hîstina şildim bildimê bû?

Em bê serêş ji vî rexê pira li ser çemê Xabûr (3) çûn wî rexî, ku başûrê welêt dest pê dika. Feylezûr ji otomobilê daket û xaka azad ramûsand. Pêşmerge pêşî ku gihayê ew himbêz û maç kir. Bi dîtina ALA RENGÎN û repe repa wê re hestên min jî tevlihev bûn. Min ev xaka pîroz di salên 70yî ji sedsala bûrî de dîtibû û lihev dabû. Ji Xaxo ta Nawpirdan, geh bi meş geh bi siwarî min ev xak pîvabû.

Danûstandina karmendên kurd ên gumrikê, yên Parastin û yên ku kaxezên otomobîlên biser hev de dibîrin, pir xweş bû, lê mixabin hinekî bîrokratîk bûn.

Ji Xaxo ta Dehokê kêmtir ji se'etekê rê kişand. Li aşxana “Şendoxa” (4) li Dehokê me firavîn xwar. Xwediyê hotêlê û aşxanê derket ku ji herêma Sersengê ye. Min di sala 1974an ta bobelata 1975an piştî peymanê Ceza-yirê, li wir kar kiribû. Wî ez naskirim û bi me ve bû lûfê ku wê rojê bibin mêvanê wî lê wextê me pir kêmbû. Berî ku em bidin rê wî nexşeya rêyek ewle ku em di Bahedrê ve herin da me. Mîr Tehsîn (5) li Bahedrê dimîne û me pir dixwest silavekê lê bikin lê mixabin wext li me teng dibû -, di Akrê, pira Qendil, Deşta Herîr, şeqlawa, Selaheddîn re em gihan Hewlêrê, paytexta xaka azakirî li başûrê welêt.

Birêz Dawûd Baxistanî li hotêla Xanzad cih ji me re girtibû. Em nêzîkî 3-4 se'etan li wir man, lê kurxalê min Izedînê kurê Çetoyê Cemilê Çeto em bi zor birin mala xwe. Hevalê minî kevn Brahîm Gabarî wan rojên em li Hewlêrê bûn, ji me veneqetiya û

deverek nema ku pêşî me neda. Dîtina Koyê di dilê min de kulek bû. Di navbera Silêmanî û Koyê de em li çend dîmenên ku mirov ji wan dilhayî dimîne rasthatin. Me ji hev re digot; ev dever hêja ye ku mirov xaniyekî lê ava bike. Em nêzîkî rojava gihan Silêmaniyê, şarê helmet û qurbanî.

Em çend rojan li Hewlêrê man. Nayê bîra min ku me xanimek kurd bi mêr an hevaleke xwe re bi tenê li aşxaneyekê, dîtibe. Bervejî Silêmanî. Li Hewlêrê me gelek didîtin ku xuya bû ew ereb in. Lê ji min re hat xuyakirin ku hijmara wan li Silêmaniyê pirtir bû. Piraniya wan genc bûn. Bi bawerîya min ew ji ber xwînrejiya rojane ku bi taybetî li rojavayê Iraqê heye, reviyane û li bajarên Kurdistanê kar û xwendinê dikin, bêyî ku di tirsê de bimînin ku kesin werin wan birevînin an wan serjêbikin.

Li vegeerê me ji Hewlêrê da rê. Di Selaheddîn, Şeqlawa, Geliyê Elî Beg re em gihan Diyana. Ji wir êdî min çavên xwe ji bigirtana min dizanibû em li kû ne. Lê vê carê gera min ne bi peyade yan siwarî, lê bi otomobîlê bû. Li herêma Barzan deverin hebûn ku min berê nedîtibûn. Min çawa ev dîmenin hewqas xweş nedîtibûn?

Me Avaşîn (7) derbaskir û di Dêrelokê ve xwe gihand Amêdiyê. Me xwest li Sûlavê (8) bêhna xwe berdîn lê tēra xwe serma hebû. Me serek li şikefta Ênişkê (9) da. Di vê şikeftê de biranînek minî taybet hebû. Min li wir emeliyata xwe ya pêşî di havîna 1974an de çêkir. Ew şeva pêşî ku ez - wek niv-cerrahekî - ji Elmanyaya gihabûm Sersengê. Mixabin deriyê şikeftê girtû bû.

Li Duhokê cih ji me re li hotêla Jiyan girtibûn. Aşxana hotêlê nûdikirin. Feylezûr hewqasî birçî bibû ku çî nemabû gezekê ji navmilê min bide. Li Dehokê jî min goştê çênî yê berxan xwest. Min dilê Feylezûr xweşkir û jê re got: Goştê berxan Duhokê ne kêmi yê berxan Silopya ye.

Bi giştî em 9 rojan li başûr man. Gelek tiştên hêja me dîtîn, lê mixabin diyardeyin ne xweş ji hebûn.



Li ber gorna Mele Mistefa Barzanî

Nêzîkbûna rêxistinên sereke yên Kurdistanê - PKK, PDK û YNK - mirov bêçare dika ku mirov di demek weha de çavê xwe ji hinek şaşiyên re bigre. Ji xwe ev nêzîkbûn bû ku hişt ez li çûna xwe bilezînim. Ev nêzîkbûn e ya ku dilê cemawerên van rêxistinên li hev vedike û wan li hev kom dika. Ev nêzîkbûn e ya ku dê bihêle ku her kesê welatparêz xwe di ber vê rohiya ku li başûr veketiyê canfida bike, wê di nav mijgûlên çavan de biparêz e.



Li ber deriyê Şikefta Ênişkê

Ji Duhokê me xwe gihand Nisêbînê û li kurapê xwe Elikê Ūsivê Elikê Batê bûn mēhvan. Kesên ku min wê şevê li wir dîtîn, ên ku hatibûn da bixêrha-



tina Elîk bikin (ji serdaneke Ewropa vegeheriya bû), ên ku min dotira rojê li nav bajêr dîtî û bi me ve dibûn zîro ku li cem wan bimînî, axiftin û hestên wan ên kurdariya nûjen, wireyên wan ên bilind û jixwebawer, baweriya min xurttir kir ku xebata tevgera azadîxwaz dê bêgoman ji nêzik bigihêje gelek ji armancên xwe. Nisêbîna di çavê min de mezintir û bilindtir bû.

Qamişloka min! Dilê xwe ji min negre eger Duhok, Silêmanî û Nisêbîna di dilê min de pêşbirkê bi te re dikin. Ji xwe ji mêj ve Amed û Mehabad di vê pêşbirkê de ne.

- 1) Cimo, yê ku serê Hacoyê II jêkir
- 2) Li gelek deveran ji Dicle re dibêjin Avamezin
- 3) Çemek e beşek jê li bakur dizê û navê wî Hêzil e, dikeve başûr û di rex diherike Zaxo re xwe tevli Avamezin dike.
- 4) Navê şikefteke dîrokî ye li herêma Badînan
- 5) Mîrê Êzîdiyên seranserê Kurdistanê ye
- 6) Herêmeke li başûrê Kurdistanê. Dikeve rojhilatê Rewanduz ta sinorê Iranê. Navenda tevgera başûrê welêt bû ku baregihên serok Barzanî û polîtîbîroya KDP lê diman
- 7) Zap jî jê re têgotin.
- 8) Havîngihêk e nêzikî bajarê Amêdiyê ye. Rêjavek pîr xweşik lê heye
- 9) Di demên şer de nexweşxane bû



Petr Kubalek filmê xwe yê li ser ola Zerdeştî û li ser kurdên Êzîdî pêşani beşdarên semînerê dike.

“Dost yar e û Berno bira ye”

SANDVIKEN/ Petr Kubalek roj-nameger û lêkofînerê Çekî ye ku bi salan e peywendiyên wî li gel kurdan hene û xebat û jiyana kurdan ji nêzik ve dişopîne. Bi gelek xwendekarên kurd ên li komara Çek re hevaltî kiriye û bi kurdan re şevên Newrozê li dar xistine. Beriya bi demekê jî filmekê dokumanter li ser ola Zerdeştî û jiyana kurdên Êzîdî çêkiriye.

Petr Kubalek roja 3 yê meha 12 an 2006 bi alîkariya Komele ya Kurd li Sandvîkenê li Folketshusa bajêr li nav kurdan bû. Kurdiya Petr baş bû, lê ne weke erebiya wî. Li gor Şahoz, ku werger ji min re kir, “erebiya Petr, ji ya ereban jî baştir” bû. Ji ber beşdarên semînerê bi giştî erebî jî dizanîn, piştî silaveke bi kurdî, Petr axaftina xwe bi erebî kir.

Petr di destpêkê de kêfxweşiya xwe anî zimên û got “min bawer ne dikir ku rojek werê û ez behsa mesela kurdan ji wan re bikim”.

Kubalek bal kişand ser rewşa kurd û çekiyan ku li hev diçe.

- Em çiqas jî aliyê cografîk de ji hev dûr bin jî, ji ber sedemên dîrokî em nêzikî hev in û rewşa me wekî hev bû. Lewra em jî gelek salan di bin destê Nemsê û Sovyet de man e.

Di beşekî mezin yê axaftina xwe de Petr li ser kesayetiyan kurd ku li Komara Çek jiya ne û behsa gi-ringiya xebata xwendekarên kurd li Çekoslovakya kir.

- Weke minak, heger li Swêdê 50 000 kurd hebin û gelek xebatên bi nîrx kiribin jî, dema em behsa hejmarê kurdên li komara Çek bikin, hejmarê wan jî 60-70 kesî derbas nabin. Bi ser vê yekê de jî bi xebateke gelek

mezin rabû ne. Ev yek pîvana mezina-hiya hewldanên wan e.


Petr di axaftina xwe de ciyekî mezin da Abdurrahman Qassemlo û xebata wî yê diplomatîk li Komara Çekî.

- Abdurrahman Qassemlo yek ji wan e ku navê kurd û Kurdistanê li wir berz kir û gelek dostên tevgera kurd çêkirin. Mirov dikare hîna jî şopên tîkiliyên baş yê Qassemlo bi Çekiyan re bibîne. Ew mirovekî sosyal bû. Gelek stranên çêki dizanî û dara ku wî çandibû hêjî şîn e.

- Kurdekî din ku di nav Çekiyan de tê naskirin û gelek xebatên bi nîrx kirine doktor û ekonomîst Yekta Geylanî (Uzunoglu) ye. Kubalek bi taybetî behsa xebata Dr. Yekta ya di derbarê teza wî ya li ser başkirina ekonomîya Komara Çek kir, ku di vê mijarê de xelatek ji yê herî bi nîrx yê Komara Çekî girti ye.

Mijareke din ya balkêş ku Petr behsê kir, “BERNO” bû. Weke tê zanîn tîvingên berno ku di nav kurdan de bi nav û deng bûn, navê xwe ji gundê Berno li Komara Çek digrin. - Weke ku kurd dibêjin “dost yar e û berno bira ye”.

Di dawîya sohbetê xwe de Petr Kubalek filmê ku wî li nav kurdên Ermenîstanê, Başûrê Kurdistanê û li nav kurdên Ele-manyayê li ser jiyana kurdên Êzîdî çêkiriye pêşani beşdarên semînerê kir.



Petr Kubalek



Dr. Yekta Geylanî xelata xwe ji destê František Janouch digre.

Tekst û foto:
Ihsan Battê
Ihsan.batte@sirwan.se
Mobil: +46 (0) 73 628 69 81



Bendawî Ilisu

Dilşa-Demirbag Sten



Katê eşrete re-wenekem deware reşkeyîyan dadekotî hemîşe le lay serçawekani rubaref Fîratewe bû. Li seretay salekani heşta da nexşey serekî bo

proje naw lê niraw be (GAP) darêjra.

Em projeye binyad nanî 22 dane bendaw, 19 dane hêzî elektrîkî be aw degrêtewe. Heta êsta projeye mebesteky ziyatir le destdirej kirdine bo ser komellani xelik û şitnewey cêmawe mejûyekanî hiç manayekî nebûwe, bêcga lew wêrankariyey ke bo ser jînge hênawetiye.

Heskîf cêgayeke rijêmî Turkiyemafi yekemî parastinî cêmawe mejûyekanî pê bexşîwe. Şareke manayekî behêzî mējûyî ayînî bo gelanî kurd, asurî û ermenî û herweha turkekanîş heye.

Ziyatir le sê hezar dêhat çol kirawe legel zawîda textî kirawin. Sedan û hezaran kes be zorî mîlî blawayan pê kirawe û rûyan le şarekanî dewr û berî nawçeke kirduwe. Derencamî em kare bote hoy bargiranî be ser şarekanîwe û haletêk le hejavî kem derametî bê endaze û destî karî herzanîş bote diyardeyakî diyare aşkîra le şarekanda.

Nexşe daryan bo dirûstkirdin.

Xercî projey bendawî Ilisu her li seratewe be girugirtî destîy pê kirduwe. Le ber du hokarî serakî her du kompaniyay biyani Skanska – Balfour Betty û kompaniyay Îtalyayî be nawî Impreglio, xoyan kêşawete. **Yekemîyan** le ber barî tirsinakî projeye û **duhemîyan**îş halwêst niwandinî çakî em kompaniyaye ke pêyan waye em projeya dij be pirinsîpî mafi parastinî mirov û parêzgerîy jînge radiwastê.

Le nameyek da be berwarî 15 î kanunî yekemî salî 2000 her du endamî naw rêkxirawî (Rêkxirawî parêzgerîkirdin le siruştî) swêdî Göran Eklöv we Göran Endal daway le berêweberî Qerzarî derewe kird ke le projey bendawî Ilisu da beşdarin.

SNF pêweye ke em projeye bê rawêj kirdin legel komellani ew xelkey ke berewra debinewe legel derencamî em kare bûn ne kirawe,

bêcga lew wêrankariye ke be ser jîngede dêwe.

“Heskîf cêgayeke rijêmî Turkiyemafi yekemî parastinî cêmawe mejûyekanî pê bexşîwe. Şareke manayekî behêzî mējûyî ayînî bo gelanî kurd, asurî û ermenî û herweha turkekanîş heye.”


Bankiy Cihanî her leber heman hokar le salî 1984 daxwazîy Turkiya bo pare qerzkirdin bo em projeye dawwe diwawe.

“Em sedeye sedey Turkiya ye, herçîy bendawî ziyatire girûgriftîy kemtîre”. Eme witey serokwezîrî-Turkiya Erdogan e.

Her bem boneye we karêkî dîr niye ke Turkiya payey be hêztîrbê. Çunke her du rubarî Ferat û Dicle le şaxekanîy Kurdistanî Turkîya haldexule, aweke le serewe berew xwar derîjê. Eme manay waye ke Iraq û Sûriye be tewawî piştbestin be siyasetî awî Turkiya. Heta êsta peywendiyekan be xirapî berêwe çuwe we hata êstaş layenekan negeyîştunete peyman nameyekî aram.

Niwênerî Iraq le Swîsra le nameyekda bo ABB û Suhuler ke serekîtirin piştîwanîy malî projey bendawî Ilisu ye. Niwêner gleyî xoy derbirîwe ke wa zanîyarîy sebare bem projeya le mēdyawe bistûwe.

Iraq û Turkiya le salî 1946 da peyman-êkiyan mor kirdiwe. Be pêy em peyman nameya Turkiya berpirsiyare ke agadarî Iraq biketewe derbarey herçî projeyek ke le ser herdu rûbarî Dicle û Ferat binyad denrê. Belam heta êsta Turkiya hiç core arezû mandiyekî xoy sebare be beşdarkirdinî wilatanî dirawsey xoy le siyasetî awî xoy nişan nedawe. Turkiya eger projey bendawî Ilisu



cebecê bikat deselatî ewey ke awriştin bo Sûriya kê mîqdarî % 40 we bo Iraq be % 80. Em zanyareye debête mayey dile-rawkê her wilateke. Sûriye û Iraq bêguman welamî em siyasete be hêzkirdinî hêzî serbazî xoyan dedenewe. Le ser nexşey geştûguzarî Turkiya Bendawî Ilisû le ser rubarî Dicle danrawe be dîrî 65 km le serey sinûrî Iraqewe. 5 î mangî ab serok wezîranî Turkiye Erdogan serdanî projey Ilisu kird bo ewey projeye bikatewe. “Katê min le diway sê roj serdanî projekem kird

û le kenar deryake westam, heşta paşmawey rengî sorî becê mawe le yarî akirbazî ew roje her mabûwe be kenar deryakewe.”

Le wê hiç core amêrek û metaryalek yan cêpêrek bendaweke nemabû. Tenha renekî sor ke be kenar deryakewe mawtewe.

Heta êstaş dekrê ke rê be dirustkirdinî Bendawî Ilisû bigirdirê


*Wergêran le Swîdî:
Sakar M. Rahîm*

Kirdinewey zankoy turkî le kurdistan drêjepêderî siyasetî toranîzme

Le dinyay emro û mêjûy niwêy mirovayetîda têkel bûn û awêtêbunî zor le keltur û dahênane zanistiyekan le nêwan netewe ciya ciyakann û gelanî dinyada bedî dekrêt, ke emeş zemîney aşnabun be kelture ciya ciyakan û sisteme ciya ciyakanî fêrkirdin xoş dekat.

Em alûgor kirdine astî zanist û bizavî roşinbîrî geyande ew astey ke emro mirovayetî mamele legel pêşkewtutirîn destkewtî em dahênane zanistiyana bikat ke helqûlawî naw zanko û nawende roşinbîryekanin. Kewate zanko diyardeyekî şaristanî û pêşkewtinî her gel û neteweyeke û bê em nawende zanistiye goranî û geşekirdin le haw komelgada bedî nayet. Boye pêwîst dekat her wek û waş bawe zanko û nawende zanistiyekan le nêw xoyanda le peywendî berdewam dabîn bo gorînewey zaniste niwêkaniyan legel yektirî û pêşxistinî rewî zanist. Zankokanî kurdistanî xoşman bêgoman nabê lem goran û têkelbune dabibrên û xoyan dure perêz bigrin.

Boye her katêk zankoyek yan na-



wendêkî roşinbîrî ca leher kwê bêt biyewêt xizmetêk be zankokanî kurdistan bigeyenê ewe debê be peroşewe baweş bo em hengawe bikeynewe, le katêk ke dezanin zankoy naw biraw be mebestî pêş xistin û çak kirdinî sistemî fêrkirdin û rewî geşe kirdinî xwêndine. Belam her katêk hest dekeyn hewlêkî derekî bo şêwandin û sîrînewey ziman û keltûrî netewekeman îytir ba le rêgay kenale zanistî û zankokanîşewe bêt, ewe wekû kurd mafî xomane le mexza û mebestî em hewle bislemînewe û lêy bitirsîn. Biryarekey encûmenî balay fêrkirdin le turkiya sebarete be kirdinewey zankoyekî hawşewey zankokanî turkiya le kurdistan mana û mebest û stratêciyêkî siyasî le pişteweye



Şagirdkanî kolejî turk Nîlufar le Hewlêr. Foto: Malperî Kolejî Nîlufar

ke bedaxewe deselatî siyasî kurd yan hêştê têy negeyştewe yan leber çend berjewendiyekî hizbî û lawekî xoy lê nezan dekat. Egîna gişt kurd em rastiye mêjuyane baş dezanêt ke turk û dewletî turk hîç katêk ney-wîstiwe xizmetî bizavî zanistî kurd û kelturî neteweyî bikat, belkû be pêçewanewe hemû kat le hewlî tiwanewey ziman û tenanet nasnamey neteweyişman dirêxî nekirdiwe.

Hewldan bo damezrandinî zankoy turkî hewldane bo ser lenwê damezrandinewe û çandinî birî toranîzm ke demêke dewletî turk xewnî pêwe debînê û le rêgay nokere dilsozekay wek berey turkmanî ke emro bote kîlkî siyasetî gilawî turk deyewê birî toranîzm le kurdistanî êmeda be fêllî kinewey zanko bikate waqayêk. Diyare pêştirîş lelayen dewletî turkewe hewlî dest têwerdanî le kar û barî naw xoy kurdis-tanda dirawe. Be taybetî le rêgay rêkxrawe benaw mirovîyekaneke be deyan hezar xêzanî kurdiyan naw nûs kird bo çend kîlo şeker û birincêk be sûd wergirtin lew barûdoxe nalebarey ke dûçarî gelekeman hatbû ledway raperînekey 1991 da. Em yarmetiye benaw mirovane way le dewletî turk kird be şanaziyewe blê sê milyon turkman le kurdistan da heye. Le katêk hemû ew xelkaney nawnûs kirabûn be naçarî û le taw êş û janî birsiyetî milyan keç kirdibû bo merc û dawakanî em rêkxirawane. Hawkat legel emeş şiwên û baregay em rêkxirawe mroyane bibwe laney dezga muxaberatî û tore casûsiyekanî turk. Emeş bo têkdan û lenaw birdinî ew ezmûney ke le kurdistan hatbûwe dî.

Emroş ke betemay kirdinewey zankoy turkî le Kurdistan metirsiyekî zor gewretir lewaney pêşû kewtote ser gelekeman û hereşeyekî tirsinak çawerwanî nasname û bûnî neteweyman dekat. Çûnke pêw waye zankoy turkî le peyamî turk peristî û kelturî netewey turk bewlawe hîç peyamêkî zanist û zanîni bo kurd pê niye. Çûnke çon qutabxane turkîyekan le Kurdistan her le seretawe mindalî kurd fêrî ziman û dab û nerîti turkî dekrên. Le êstawe dayan debrrin le kurdewarî û nerîti neteweyîy xoman. Ca zankoy biryar drawîş heman erk û wacibî qutabxaneyanegrine esto. Belam be şeweyekî ekadîmyane û be plan û siyasetêkî wîrd û jîranetir. Egîna dewletî turk eger ewende le xemî kurd û peroşî pêşkewtinî rewî zanste le Kurdistan boçî nikolî le bûnî bist milyon kurd dakat lew beşey bakurî kurdistan da? Boçî ziman û tenanet dab û kelturî neteweyî kurdiş qedexe kirawe? Em siyasete şovînistaney dewletî turk taze niye û mêjûyekî konî heye û seretakey degerêtewe bo ew rojgarey komeley "Îttîhad û tereqî" katê be çend salêkî kem ber le dest pêkirdinî şerî cîhanî yekem hatine ser hûkim û destûrî dewletî usmaniyan gorî, bo asan welamî gelanî xeyre turk, betaybetî gelî kurdiyan dawê. Paşan cêbecê kirdinî em peyame netewe perestiye be Kemal Etaturkî gewre şovînistî turk spêrdira û emîş be dewrî xoy hîç behaw rêzêkî mêjû nasnamey netewey kurdi nehêştewe.

Eweta le ensîklupîdyay turkî ke

le serdemî Etaturk le salî 1936 da derçuwe delê: Netewey kurd beşêke le netewey turkî dayk û zimanekêşî zimanî turkiye û wişey Erebi û Farsî kewtote nawî. Bem core lem rojewe nikolî le bûnî kurd û zmanekêşî dekrêt. Şagirdanî diway Etaturkîş wek Îsmet Inonu û Kenan Evren û Bulent Ecevit û ewanî tir hîç katêk danyan be bûnî kurd danenawe û le mamostakanî pêşûy xoyan baştir nekirdiwe.

Kewate hîç ûmêd û tîrûskayîyek le deselat daranî turk ne bedî kirawe û ne bedî dekrê. Ke le sêberî em tîrûskayîye da gelî kurd hest be bûnî neteweyîy xoy bikat keltur û rewî zanist û xwêndin le sayey eman pêş kewêt û geşe bikat. Boye çaktir waye ke dewletî turkiya le ciyatî kirdinewey zankoyekî lem core be pispor û zaniste niwêyekan zankokanman dewlemend biken. Eger peroşî pêşxistinî êmen.

Deselat daranî kurdiş ba lecyatî ewey mindalanî kurd û newey kurd be kelturî goş bikat, ba le darî darawe rewrewey pêgirtinî mindalî kurd dirûst bikat û ta lem darewe binaxey zanist û xwêndin ber bigrêt û le sayeyda komelgay kurdewarî legel dinyay serdemda birwat.

Mohamed Izzadîn



“Me Kirmanckî hilbijart”

Hevpeyvîn: Amed Tîgrîs / Amîda Kurd



Mamoste Amed Tîgrîs li gel J.Espar, ji xwedî û nivîskarên Kovara Vate yê.

Foto:AMÎDAKURD

- Merheba birêz Espar, tu bi xêr hafî.
- Ez dixwazim di derheqê kovara Vate de çend pirsan bikim. Belê, ne bi tenê kovar herweha gelek semîner, konferans, civîn û berhemên we yên din jî hene. Pirsar min a pêşî kurdên ku bi zaravayê dimilkî (zazakî) dipeyivin li kîjan perçe û li kîjan herêmî dijîn?
- Bele, kurdên ku bi kirmanckî (zazakî) dipeyivin, em jî wan re dibêjin kurdên kurmanckîaxêv (zazakîaxêv). Ji bo kurdên ku bi zazakî dipeyivin çend term hene. Yanî em zazayên herêmên cihê cihê wan terman bi kar tinin. Hinek jî yên din jî me re dibêjin an nav li me kirine. Ji bo lehçeya zazakî an jî dimilkî çar termên cuda hene: Zazakî, dimilkî, kirdkî û kirmanckî.
- Lêbelê hûn bi xwe jî van çar terman kîjan rast dibînin yan jî hildibijêrin?
- Me wek “Gruba Xebatê ya Vateyî” terma kirmanckî hilbijartîye. Loma ez dixwazim di vê hevpeyvînê de jî terma kirmanckî bi kar binim. Em bê ser pirsar kurdên kirmanckîaxêv. Ev kurd li Bakurê Kurdistanê li van çend bajaran dijîn: Amed (Diyarbakir), Çewlîg (Bîngol), Riha (Urfa), Semsûr (Adiyaman), Sêrt, Bidlîs, Dêrsim, Mûş, Erzingan û Xarpêt (Elezîz).
- Yanî hemû li Bakur in?
- Belê, hemû li Bakur in.
- Wek hejmar zêde li kîjan wîlayetî ne gelo?
- Bêtirê wan li nav tixûbên wîlayeta Amedê dijîn. Piştî, Çewlîg û Dêrsim tèn.
- Gelo di zaravayê me yê zazakî
- İstatîstîk tune, lê mirov dikare bi texmînî bêje hejmara kirmanckî-axêvan çend e?
- Mirov dikare spekulasyon bike, lê ez bawer dikim hejmara wan jî sê mîlyonî ne kêmîr e.
- Wek tê zanîn di her zaravayî de devokên cihê cihê jî hene. Wek nimûne di zaravayê me yê kurmanckî de devokên wek Badînî, Cizîrî, Berîradî, Amedî, Serhedî û hwd hene. Gelo di zaravayê kirmanckî (zazakî) de jî devokên weha cuda hene an na?
- Belê hene. Heger mirov bi giştî bêje an jî nêzikî hev bike, dikare bêje çar devokên kirmanckî hene. Devokên Dêrsim û Gimgimê (Varto), ev herdu nêzikî hev in. Kirmanckîya Sêwreg û Çêrmûgê jî nêzikî hev e û mirov dikare bêje ev herdu jî devokên in. Pîran, Palo û Çewlîg jî nêzikî hev in, herweha mirov dikare jî van re jî bêje yek devok. Û kirmanckîya qeza Bidlîsê Motkî bi serê xwe devokên e. Bi kurtî mirov dikare devokên kirmanckî bi vî awayê tesnîf bike.
- Zaravayê kirmanckî bêtir nêzikî kîjan zaravayên kurdî yên din e? Yanî nêzikî kurmacî ye, soranî ye, hewremanî ye an jî kîjan e?
- Li gor zimanzanên kurd û yên bîyanî ku heta niha di vî warê de xebitîne dibêjin, hem jî aliyê gramerî û hem jî di aliyê gotinan de kirmanckî zêde nêzikî zaravayê hewremanî ye. Dîsa di soranî û zazakî de peyvên muşterek hene. Gelek gotin û hin formên gramera kurmanckîyan badînan û kirmanckî hevdu digrin an jî wek hev in. Lê bi giştî fikrek heye ku kirmanckî (zazakî) û hewremanî bêtir nêzikî hev in.

de jî wek zaravayê me yên din de pirtûk û berhemên klasîk an jî yên kevn hene?

- Niha di destê me de hin tekstên yanî metnên kirmanckî ku di demên berê de hatine nivîsîn, hene. Peter Ivanowîç Lerchî tekstên kirmanckî (zazakî) berhev kirine. Û ev tekst bi ferhengeke rûsî-kirmanckî, di 1858an de li St.Petersburgê hatine weşandin. Tekst jî devê hin kirmanckîyan hatine nivîsîn. Tê zanîn ku Lerchî herweha tekstên kurmanckî jî berhev kirine. Mirov dikare bêje metnên kirmanckî yên peşî ew in. Piştî yên ku kurdan bi xwe nivîsîne hene. Mele Ehmedê Xasî kitêba yekem a kirmanckî nivîsiye. Xasî di sala 1899an de, li Diyarberkirê mewlûda xwe ya kirmanckî (zazakî) nivîsandiye û çap kiriye. Piştî mewlûda Xasî, Osman Efendiye Babîjî di 1903an de mewlûdeke din nivîsiye. Mîr Celadet Bedîrxanî di sala 1933an de ev mewlûd li bajarê Şamê çap kiriye. Piştî van herdu kitêban heta sala 1963an tişt nehatine nivîsîn. Heger hebe jî em nizanin. Di sala 1963an de li Stanbolê di rojnameya Roja Newe de nivîsên kirmanckî derketine. Ji xwe navê rojnameyê jî bi kirmanckî ye. Kovar û rojnameyên mîna Özgürlük Yolu, Roja Welat, Devrimci Demokrat Gençlik û Tîrêj ku di salên 1970-80yî de derketine, kirmanckî hatiye nivîsîn.

- Em niha dikarin êdî behsa kovara Vate bikin? We kengê dest bi derxistina kovara Vate kir?

- Mamoste, wek tu bi xwe jî dizanî di sala 1980î de li Tirkîyê cunta eskerî hat ser hukim û hinek kurdên siyasî derketin derî welat. Helbet di nav wan de kurdên kirmanckîaxêv jî hebûn ku li ser ziman dixebitin an jî dizanîbûn bi xwe re hinek tiştên pozîtîv jî anî. Yek jê jî ew bû ku li derê welat kirmanckî (zazakî) hat nivîsîn. Ji salên 1980î heta salên 1990î di gelek kovaran de kirmanckî (zazakî) dihatin nivîsîn. Di salên 1990î de di nav nivîskarên kurdên kurmanckî de munaqeseya pirsar rastnivîsandîne dest pê kir. Ji ber ku her kesî li gor bîr û bawerîya xwe, bi qasî ku dizanî û li gor devoka gund an qeza xwe dinivîsî. Ji bo rastnivîsandîne tişteke muşterek tune bû. Ew kesên ku bi xwe dinivîsand carnan wan bi xwe jî nivîsîn hev fêhm nedikirin. Munaqeseyek derket, gotin heger em dixwazim ev zarava bi pêş bikeve,



divê em bi hev re karek bikin; hinek qaîde û prensîbên rastnivîsandîne ava bikin. Loma cara yekê di sala 1996an de, li Stokholmê civîneke hat lidarxistin. Li ser rastnivîsandîne, li ser bikaranîna hin termên muşterek û li ser bi hevdu re karkirîne hin biryar hatin girtin. Di sala 1997an de civîna duyem hat çekirin. Biryar hat girtin ku kovarek were derxistin û biryarên wan civînan di vî kovarê de bûn weşandin. Vate di sala 1997an de, di meha tebaxê de derket. Heta niha 26 hejmarên kovarê derketine. Vate jî hejmara 1ê û heta 20an hem li Stokholmê hem jî li Stanbolê hatiye çapkirin û belavkirin. Piştî hejmar 20an Vate êdî çû Stanbolê. Niha li Stanbolê tê weşandin û jî wê tê ewropayê jî.

- Birêz Espar, bi kurmanckî wateya “Vate” çi ye?

- Vate bi kurmanckî tê wateya “peyvî”ê yanî “gotin”ê.

- Ne bi tenê zazakî herweha zaravayên me yên din jî hûn nebûne zaravayên nivîsê. Di kurmacî de dîsa Celadet Bedîrxan di dema xwe de alfabe, rastnivîsîn û gelek gelek tiştên din nivîsandiye û jî wan re qanûn û presîban daniye. Îro jî nivîskar û helbestvanên kurmanckî li gor wan qanûn û presîban dinivîsîn. Lê yê kirmanckî wek we jî da diyarkirin heta dema Vateyî dezgeheke weha ne bûye. Niha hûn dema karê radaksiyônê dikin yan civîn û semînerên xwe bi çî awayê bi rê ve dibin? Qaîde û presîbên we hene? Ku hene gelo çî ne?

- Belê, presîb û metodên me yên xebatê hene. Wek grûba Vateyî, me heta niha 13 civîn çekirine. Ev grûba

me mîna "Grûba Xebatê ya Vateyî" tê nasîn. Me bi xwe di destpêkê de hinek prensîb qebûl kirin. Prensîba me ya yekemîn ev e ku hemû kesên ku beşdarê civînê an jî civînan dibin, divê xwe wek kurd bizanibin û kirmanckî (zazakî) jî wek zaravayekî kurdî qebûl bikin. Kesên ku beşdarên van civînan dibin dîtînen wan yê sîyasî gelek cihê ne. Yanî ne hevalên hev in û ne jî ji partîyek an jî rêxistinek in. Lê ew dixwazin li ser kirmanckî bixebitin. Em dixwazin ku ji hemû bajar, qeza û heremên ku têde kirmanckî tê peyivîn bi kêmasî kesek beşdarê civînên me bibe. Ji ber ku em dixwazin bizanibin ka wekhevî û cihêtiyên devokên me çi ne. Em dixwazin hemûyan tespît û berhev bikin. Me gotiye ku ew kesên ku beşdarên civînan dibin, peşî demê ew bi xwe biryarên me bi cih bînin û xwedî li prensîbên me derbikêvin û wan biparêzin. Dema em bi xwe biryar bigrin û em bi xwe wan biryarên xwe bi kar neyînin, wê demê ciddiyeta vî karî namîne. Armanca van civînan standardkirina zaravayê me ye kirmanckî ye. Ji ber wî jî em di van civînan de çend karan bi hev re dikin. Em pêşî li ser termînolojî û hin babetên rastnivîsînê ê acil rawestiyân.

- Mesela alfabe çawa ye? Hûn kîjan alfabe bi kar tînin? Alfabe ya Celadet Bedirxan bersiva zaravayê me ye kirmanckî jî dide, têr dike an na?

- Alfabe ya me, alfabe ya Celadet Bedirxan e ku îro hemû kurdên ku bi latînî dinivîsîn, bi kar tînin. Me vê alfabe yê di civîna xwe ya yekemîn de wek prensîb qebûl kir. Ji derê vê alfabe yê em tu alfabe yê din qebûl nakin û tîpên vê alfabe yê kêman zêde nakin. Ji bo kirmanckî problemeke me û alfabe yê îro tune ye.

Me heta niha li ser termînolojîya perwerde, ziman, termînolojîya îdarî-sîyasî, hiqûqî û eskeriyê hinek tişt tespît kirine. Me hin problemên zimanî ku bi rengdêr, navdêr, cînav, daçek û lêkeran re têkildar in munaqêşe kirine û hin biryar girtine. Me biryarên rastnivîsînê bi navê "Rastnivîsînê Kirmanckî (Zazakî) mîna kitêb weşandiye. Em dema ku peyivêk munaqêşe dikin em hemû versiyonên wê peyivê li pey hev dinivîsin. Pêşî em nabêjin "ev rast e û ev jî ne rast e." Yan jî gotina standart ev e. Na, em hemûyan carekê dinivîsin. Piştî ku me biryar da ka em kîjan peyivê jî xwendewanan re wek peyivê standart pêşkêş dikin, em versiyonan

jî mîna versiyona wê peyva standart dinivîsin. Ji aliyê ve, ev xebata me dibe xebateke komkirina gotinan, devokan yanî xebateke folklorî ye jî. Piştî ew gotinên ku em li ser wan bi hev dikin, em ferheng an jî ferhengoka wan çedikin. Ev ferheng dibe ferhenga me ya standart. Me di encama van civînan xwe de heta niha ferhengeke çap kiriye. Çapa wê ya duyem jî derket.

- Ferhenga we bi tenê bi zazakî ye?

- Na, bi zazakî - tirkî, bi tirkî - zazakî ye.

- Ew gotin an jî termên ku di zaravayê zazakî de tune ne, hûn jî bo wan çî dikin? Çê dikin, jî zaravayên din an jî zimanêke din digrin, çî dikin?

- Girêdayê gotinê ye. Ku gotineke weha ye ku ji zimanê biyanîyan ketiye zimanê me û di nav xelkê de tê bi kar anîn em wê qebûl dikin. Na, ku weha nebe em li kurmanckî, soranî û hewramî dinêrin. Dema gotinek di van zaravayan de jî tune be, vê care em li zimanê farisî (ji ber ku nêzê kurdî ye) û zimanên din dinêrin. Gotinên ku di zaravayên soranî, kurmanckî û hewremanî de hebin em wan tercîh dikin. Gotinên biyanî yê ku ji erebî, farisî an jî tirkî ketine nav zaravayê kirmanckî, ku gelek telifuzên wan ê cihê hebin em telifuza herî nêzîkê orijîna gotinê digrin.

- Dema hûn bikevin tengasiyê, hûn gotinan çêdikin?

- Na, em gotinan çê nakin. Wek prensîb em çêkirina gotinan heta pir mecbûr nebînin rast nabînin. Ji ber ku em dizanin zerarê gotina çêkirî gelek e.

- Baş e, ev pirtûk an jî berhemên ku li welêt çap dibin û nivîsên ku ji welêt jî kovarê re tên şandin, li gor prensîbên rastnivîsandina Grûba Xebatê ya Vateyî ne an jî wek berê herkes li gor devoka qeza an jî gundê xwe dinivîse?

- Em jî tu kesî re bêjin "hûn divê wek me binivîsin." Heqekî me ye wêha tune ye. Lêbelê em kêfxweş in ku, berhemên ku heta niha hatine nivîsandin, li gor wan prensîbên rastnivîsandina ku me qebûl kiriye, tên nivîsandin. Ev jî kêfa me tîne. Nivîsên ku ji kovarê re tên jî, em wek wek prensîbên xwe redakte dikin. Heta niha problemeke mezin derketiye.



Grûba xebatê ya Kovara Vate li li Kurdistanê li konferansa hewremanî û kirmanckî. Foto: www.vateonline.se

- Di van agahdariyên we de baş xuya dibe ku giraniya bar û xebatên zaravayê kirmanckî li ser milê kovara Vate û komên derdora kovarê ne. Gelo niha jî derê koma Vatê, kovar, weşanxane an jî dem û dezgehê wek Vate ku bi awayekî zanyarî li ser zaravayê kirmanckî dixebitin, hene?

- Na, xebateke weha tune. Lê bi navê Weşanxaneyê Vateyî li Stanbolê weşanxaneyek heye. Ez dixwazim bêjim ku eleqeya vê weşanxaneyî ya organîk bi "Grûba Xebate ya Vateyî" re tune. Xwediyê weşanxaneyê kurdekî dilsoz e û bi serê xwe karê weşangeriyê dike. Bi piranî pirtûkên kirmanckî çap dike û diweşîne. Heta niha 20 pirtûk jî aliyê Weşanxaneyê Vateyî ve hatine weşandin. Ji wan 18 kirmanckî û du heb jî kurmanckî ne.

"Alfabe ya me, ya Celadet Bedirxan e û ji derê vê alfabe yê em tu alfabe yêke din qebûl nakin"

- Di van deh salan de xebata grûba we çî tesîr kirmanckîya nivîskî kir?

- Dema ku me dest bi derxistina kovara Vateyê kir hin armanc û hedefên me hebûn, tam nebe jî heta îro em gehîştine hin ji wan. Gava ku meriv bi destpêkê re miqayese dike, îro hejmara kesên ku dikarin bi kirmanckî bixwînin û binivîsin zêdetir bûne. Ya duyem, berê xebata me li welêt bû ku em kesên li welêt re alîkariyê bikin, wan teşwîq bikin da ku nivîskar û xwendevanên kirmanckî zêde bibin.

Di hejmara nivîskaran de zêdebûn jî rûpelên Vateyî xuya ye. Belê, kovara Vateyî jî çû Stanbolê.

- Hevî dikim here Amadê!

- Armanc û daxwaz ew e. Bi rastî karê me tesîreke baş li nivîsandina zaravayê kirmanckî kiriye. Ji sala 1899 heta 1996an 23 kitêbên kirmanckî derketine. Lêbelê, ji sala 1996an heta 2006an, 60 kitêbên kirmanckî derketine. Piraniyan van berhemên li welêt jî hatine weşandin. Bêguman tiştên ku em jê gelek ne razî ne jî hene. Îro kovara Vate û kitêbên kirmanckî di gelek bajarên Kurdistanê û li Tirkîye bi serbestî tên firotin. Lêbelê hejmara kovar û kitêbên ku tên firotin qet ne bi dilê me ye. Bi kêmanî sê mîlyon kurdên kirmanckîaxêf hene. Sê mîlyon û 83 kitêb! Û ji wan 60 heb di deh salên dawî de hatine weşandin. Rast e, jibo kirmanckî pêşketin e lê ku meriv bixwaze bi zimanekî adetî re miqayese bike, malxirabî ye.


- Wek we jî got, Kovara Vate hêz û bingehe xwe ji van civînan we digre. Gelo dê ev civîna we ya dawî kengê, li ku û mijara wê çî be?

- Di vê mehê de em civîna 14an çêdikin. Em civîna xwe ya 14an li Hewlêrê çêdikin. Belê, em ê di navbera 16-17 meha 11an de, li Hewlêrê kom bibin. Ev civîna bi însiyatîfa Wezaretê Rewşenbîriya Kurdistanê çê dibe. Mijara civînê, zaravayên kirmanckî û hewremanî ye. Dê 15 kes jî Grûba Xebatê ya Vateyî û 15 kes jî, ji hewremanên Başûr û yê Rojhilat beşdar bibin. Cara yekem e ku li welatê me civîneke weha çêdibe.

- Spas ji bo van xebat û agahdariyan! Em jî we re serkeftinê dixwazin!

- Bijî, ez jî spas dikim.

NÛÇE



Li Stanbolê Konferansa Mehmed Uzun

Yekem care ku li Tirkiyê li ser nivîskarekî kurd konferanseke navnetewî li dar dikeve.

Roja 17 ê Sibate li Zanîngeha Zanyariyê li Stanbolê, bi hevkarîya Anadolu Kültür, Bilgi Üniversitesi, Komîteya Mehmed Uzun li Swêdê û Balyozxaneyê Swêdê ya Stanbolê konferansa Mehmed Uzun pêkhat.

Romannivîsê navdar Yaşar Kemal, serokê şaredariyê yê Sûrê Abdullah Demîrbaş, Dr. Tarik Ziya Ekîncî, serokê Enstîtuya Kurd ya Stanbolê Samî Tan, rojnameger û serokê kevin

yê Yekîtiya Nivîskarên Norwêç Thovald Sten, nivîskarê Swêdî Gellert Tamas, endamê PEN a navnetewî Eugene Schougin, Serokê yekîtiya weşangerên Ewrûpa û Swêdê Jonas Modig, Osman Kavala, wêjevan Firat Cewerî û gelek nivîskar û rojnamegerên kurd û tirk beşdarî konferansê bûn.



Çavkanî & foto:
Ajansa Nûçeyan ya Firatê - ANF

PIRTÛKÊN NÛ

■ Peyvên Êşmij

- Serkan Brûsk

Ronî


Dengê min bibe xwe
Kîş bike bilacengên serê xwe
Bila ronîya dilan bide lêvan
Xweşiya jiyane bigerîne li
hinavan
Şevan betal bike, ji dilê xwe.
Rojên biken wê bèn



■ Ji Enfalê şeveke bê sibe

- Kamran Simo

ji dojeha bîra zilma xwe
dilê min biraştin
li asîmanê evîne
çavên min
bêken hiştin
li biyawanê
derya xeman
bi min dane vexwarin



■ Dara Sawêrên Tî

- Hoşeng Osê

Di hindek kêlikên
dijwar ên peyvê de,
di kildankên xewnê
de asê dimînin û
nema dikarin li me û
li siberên me yên ji
velerzîna serdemên
qedexekirinê ji nû
ve, li me digerin û di
jenên axa dilê me de
vedihesin.

Di wan kêlikên tîji kêl
û darbest de, helbesta
me şoreşan û kuştaran
û şehîdan, nehvirin û dilokan û reşgirêdanê, bi
kurtî, mirinê û pismamên wê dibêje.
Aniha, em ji xwe dipirsin, gelo ev anihaya han
çawan di dilê me daçikiya?
Aniha çavên helbestê pêrgî rondikên me dibin!
Aniha rondikên me pêrgî kêrên berikirinê dibin!
Aniha berikirinên me pêrgî sirûdên xwinê û
gulgenimên xatirxwestinê dibin!
Aniha em û xatirxwestinên xwe ber bi hev ve di-
herikin û em bi hev re li êşên xwe, li şikestinên
xwe û li asoyên xwe yên birindar dipirsin!
Aniha herikîna me û Şengo bi hev re, guncîna
me ya bi peravên helbestê re hêsantir dike, dilê
me dispêre rewanebêjiya peyvê û peyvê ji bi hest-
darî dispêre kildanka xewnê.



Ehmedê Huseynî



em mala we ava dikin...

Simko Haco

Seeg 11 F, 811 33 SANDVIKEN
Tel: +46 (0) 73 626 38 70
e-mail: simko.haco@malava.se
www.malava.se

**MAL - AVA - şirket nû
ya avahiya li Swêdê ye.**

**-Navenda me li bajarê
Swêdê Sandvikenê ye lê
em li seranserî Swêd di
xizmeta we de ne.**

**- Tu dixwaze xaniyekî li gor
dilê xwe avabike lê tu ni-
zane ji ku destpê bike?**

Hingî li me bigere!

Çîrok / Rûn û hingiv

Hebû tunebû, carekê ji caran zilamek hebû. Navê wi belengaz bû. Belengaz ji xwe re li parsê digeriya û qûtê xwe yê rojane peyda dikir.

Rojekê ji rojan çû malekê. Xwediyê malê hal xweş bû. Xwediyê malê ji Belengaz re got: "rojê carekê were vir û hinek xwarin ji xwe re bibe."

Pir kêfa Belengaz hat. Her roj belengaz diçû mala ê zengîn. Xwediyê malê jî, rojê carekê, hinek hingiv û rûn dida Belengaz.

Belengaz ji xwe re du şerbik anîn û li bin zikê xanî daliqandin. Ji rûn û hingivê ku tanî malê hinek di xiste şerbikan û hin jê jî dixwar. Demek dirêj derbas bû bi vî hawayî.

Rojekê ji rojê havînê, Belengaz ji nava gund hat, li nivê malê ji xwêre cilek raxist, li ser piştê xwe palda û li şerbikên di ser xwe re nerî.

Paldayî lingek avête ser lingê din û kete nav xewn û xeyalan. Wî qederekê ji xwe re li şerbikan nerî, gopalê xwe girt û hejand.

Hizirî û xwe bi xwe wiha got: "Dê ev şerbikên min tije bibin. Ez dê herduyan bifroşim, ji xwe re bizinekê bikirim. Paş salekê wê bizinamin karekî bîne, sala din wê kareke din çêbibe û wê bibin bizinek û du kar. Ez dê herdu karan bifroşim û bizineke din bikirim. Wê bibin du bizin. Paş salekê din wê ew bibin du bizin û karek. Sala din wê çar kar û du bizin û sila bi dûv de wê her du bizin du karan û her du tiştîr jî dê du karên din binin û wê bibin şeş. Ez ê wan bifroşim û ji xwêre çêlekekê bikirim. Piştî salekê çêlekê dê bizê û golikekê bîne û bibin dîdo. Di pênc salan de ew dê bibne deh. Ev deh dê bibin bist. Bistê min dê bibin sih. Sih dê bibe çil, pêncî û şeşt. Êdî ezê hinekan bifroşim û ji xwêre perçak erd û du gayan bikirim. Ez ê ji xwêre rêncbereki bigrim.



Foto: Bahram Haco

Dê zadêmin çêbibe, perê min çêbibin, ez ê xanîyekî pir xweşik ji xwe re lêkim. Dûvre ez ê jineke pir ciwan û xweşik ji xwe re bînim, Dê lawekî min çêbibe. Ez ê mamostayê herî jîr û zana jê re bigrim û wî fêr bikim. Dê lawê min mezin bibe. Lê heger ew bi ya min neke, ez ê bi gopalê xwe bigrim, bi hejînim û çendekan lêxim". Û Belengaz bi gopalê xwe girt û hejand.

Gava gopal hejand, gopalê wî li şerbikekî ket. Şerbik li şerbikê din ket, her du şerbik li hev ketin û şikestin. Rûn û hingiv tevlihev bûn û biser serê Belengaz de rijîyan.

Keda Xelef çû bertelef!

Ji pirtûka feylezofê Hindî Beydaba a bi navê Kelile û Dimne / Kurdiya wê: **Mirza Bahram**

Bîrnebûn 32 derket

Hinek mijarên di vê hejmarê de:

Bila sala nû ji bo me giştika pîroz be!- **Ali Çiftçi**
Rapora 2006an ya Komîsyona YE:
Naverok û encam
- **Nebî Kesin**, Konferansa parastin û perwerdeya zimanê kurdî li Diyarbekirê Hîndekariya kurdî li Swêdê - **Ali Çiftçi**, Kilama Şêxê Hec Elî - **Nuh Ateş**, Qirana ermenî û ruman li Anatoliyê - **Dr. Mikailî**, Em kurd tev mîna sêvên ji darekê ne!
- **Kemal Topal**, Şin û şewat - **Altun Başaran**
Sohbetek bi **Ozan Şêxo** re - **İhsan Türkmen**

www.birnebun.com




Nûbihar -100 derket

Nûbihar gihişte hejmara 100ê û bi hejmartike taybet derkete pêş xwendevanan... Hinek nivîsên di vê hejmarê de: Süleyman Çevik "Umrek me bi Nûbiharê re derbas kir", Ali Karadeniz "Sed carî Nûbihar", Sabah Kara "Kultur zik tîr nake", Ayhan Gevêrî "Rola Kovaran û çiyê Nûbiharê", Rojen Bernas "Jimara sedî ya Nûbiharê" M. Emin Bozarslan "Xweştir e", Ehmed Akin "Sê xisûsiyetên Nûbiharê", Adar Jiyan "Bi hêviya temenekî dirêjtir".

Wekî din, Cankurd, Ferid İzol, Murad Celalî, Dr. Muhsin Doskî, Mueyyed Teyyib, Tehsîn İbrahim Doskî, Dr. Naci Kutlay, Salih Kevirbirî, Selim Temo, Ahmet Aras û Roşan Lezgîn di vê hejmarê de hene.

Ligel wê Mehmed Uzun jî ji bo pîrozbahîya hejmara Nûbiharê ya 100. Name'yek rêkirîye û ew jî bi destnivîsa Mehmed Uzun ya orjînal di kovarê de cihê xwe digire...

www.nubihar.com



NAMEYÊN WE

"... yek hevok jî bi tenê ji aliyê rastnivîsê ve durist ne hatîye nivîsandin..."

Silaveka gerim bo karbedestên hêja yen kovara SÎRWAN!

Di pêşiyê de ez pîr ji dil destxweşiyê li renca hewe dikim û daxwaza serkeftinê jî we re dixwazim. Birastî karek pîr hêja ye û babetên balkêş jî di kovara we de hene, nemaze bi her du zimanên kurdî û siwêdî.

Lê rexnek min heye. Hêvidarim rexna min bikare zêdetir kovara Sîrwan ava bike. Ew jî di hijmara duyan de berperê 10an derbareyî nivîsandina zaravê soranî bi pîtên latînî, bi taybet jî wîlara li ser (Kongrey Salaney yekêfî jinanî Komeley Kurd le Gävle) ê. Ez dikarim bêji yek hevok jî bi tenê ji aliyê rastnivîsê ve durist nehatîye nivîsandin, bi taybet pîranyên pîta (e) bi (a) hatîye nivîsandin. Herwisn hinek şaşiyên rêzimanê jî hene.

Nivîsandin bi vî awayî wê xwendevanan ji kovarê dîr bixe. Ez dibêji ewê ku zaravê soranî bi pîtên latînî bini-vîse gereke şarezayeka baş hebe li ser elfebêya latînî.

Hêvidarim ev gotinên min cihê rezamendiya we bin, ji ber ku kovarek bi nivîskî li ser kaxezê bête belav kirin pîr girînge bi kurdîyeka rast bihête nivîsandin, bitaybet jî zimanê me pêdivîyek mezin bi başkirinê û pêşxistinê heye.

Digel rêzên birayê we Nişan Bamernî / Swêd

"... yê di vê kovarê de dinivîsin ew bi xwe profesyonelîn û hemû mamoste û rewşenbîrê Kurd in..."

Silav û rêz!

Ez ciwanekî 24 salî me, bi eslê xwe ji Bakurê Kurdistanê jî navçeya bajarê Mêrdînê ji Dêrik'a Çiyayê Mazî me û niha li Mêrsînê Zanîngehê dixwînim. Dema ku ez bi weşana kovara we agahdar bûm bi rastî ji ez pîr kêfî xweş û dil şa bûm, jiber ku jibona pêşketina zimanê Kurdî kovareke din jî li me zêde bû.

Kêfî xweşiya min ya herî mezin, yê di vê kovarê de dinivîsin ew bi xwe profesyonelîn û hemû mamoste û rewşenbîrê Kurdin, bi hêviya Zimanê me pêşvekeve û hemû gelê Kurd fêrî zimanê xwe bibe.

Bi hêviya Azadiyê!
Kovara Sîrwan Pîroz be...
Di Xebata we de serketinê dixwazim...
Di gel silav û rêz...

Serdar Ozcan / Mersîn

"...derfetên we hene ku hun kovarê bi riya postê ji min re..."

Xebatharên kovara Sîrwan,

Ez wê mailê ji Meletiyê, bajarê Kurdistanê dişînim. Ez li Zanîngeha İnönüyê xwendekarê zanîngehê me. Xebatên min li ser hînbûna kurdî hene. Ez li Meletiyê jî bo xwendekarên zanîngehê hinbibin qursa zimên didim. Ji bo ku we kovara Sîrwan derxistîye ez we pîroz dikim, di kar û xebatên we de serkeftinê dixwazim. Gelo derfetên we hene ku hun kovarê bi riya postê ji min re rê bikin. Ger ku derfetên we hebin hun bişînin ezê gelek kêfxweş bim. Niha bi xatirê we, silav û hurmet!

İzzet A / Meletî

"abonetî çawa dibe..."

Slav Sîrwan!

Ez li Anatoliya navînim. Cihanbeyli ya Konya. Abonetî çawa dibe? Kovar tene Tirkîyê?

Apo Duran / Cihanbeyli